

folklorame

f





SPAS JI BO
ALÎKARÎYA WAN

Dûrzan Cîrano
Eşref Bolumcu
Ferhat Arslan
Mazlûm Sîyabend
Selmet Guler
Ugur Sermîyan
Tehsîn Baravî
Zeynep Yaş

TÊKILÎ

folklorame@gmail.com ✉
folklorame 📧 📷 📺 📱

Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpîrsîyar e.

Kovara folklorê ya sê mehane

Sal: 1

Hejmar: 1

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

Berpîrsa Nivîsan: Gevrîye Atli

Edîtor: Eşref Keydanî

Redaksîyon: Bahoz Baran, Eşref Keydanî, Evîndar Şevîn

Desteya Weşanê:

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Evîndar Şevîn

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

Grafîk: Sevinç Adiyaman

Wêneyê bergê pêş: Eşref Bolumcu

Wêneyê bergê paş: Arşîva Sînemaya Rojhilata Navîn

Navnîsan: Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eğitim Bilim Sanat Sağlık ve Kültür Vakfı

İktisadi İşletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır

Sertifika No: 42382

Çapxane: Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti.

Orta Mah.Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa-İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

Sertifika No: 16919



Pirtûka pêşnîyazkirî

Navê pirtûkê: Folklorê Kurmancîyê

Nivîskar: Hecîyê Cindî

Weşanxane: Lîs

 www.saradistribution.com



Hecîyê Cindî & Zeyneva Îbo-1931



 Selmet Guler

Naverok

- 6 Rovî, dîk, kew û ordek, **Rênas Xendekî**
- 10 Şîn û rîtuêlên şîne li Tizyana Mêrdînê, **Mem Mukrîyanî**
- 22 Danasîna pirtûka “Folklorî Kurdî”yê, **Evîndar Şevîn**
- 30 Li ser kûçikan gotinên pêşîyan, **Mahîr Ugur**
- 32 Stranek, serpehatîyek “Lê Yarê”, **Sadiq Reşwan**
- 35 Navên gundên Silopyayê, **Xalid Celalî**
- 36 Çar meselokên gundê Pîranê, **Remzîye Oncel**
- 38 Dîlok, **Vildan Sevîm**
- 43 Nazenîn, **Mehpûs Serhedî**
- 51 Efsaneya Êlê Şaze, **Surya Human**
- 53 Cotkaryo, **Zîya Mukrîyanî**
- 55 Kevneşopîya beranberdanê li Agirîyê, **Nihat Oner**
- 58 Çend nîşe derbarê berhevkarîya edebîyata kurdî ya gelêrî da, **Mustafa Ozturk**
- 64 Hebnîsk, **Gulîstan Oncu**
- 65 Hevpeyvîn bi dengbêj Feleknazê ra, **Roza Sîerra**
- 69 Ji hebûkî tirî ra mahseryek lazim e, **Bêrîvan Matyar**
- 79 Çilbiska Şimikzêrîn, **Asmîn Üyanik**
- 89 Morfolojîya “Çîroka Bengîn”ê, **Haşîm Esen**
- 96 Peyvên kêmnas yên Pasûrê-1, **Bahoz Baran**
- 98 Lihevanînok, **Elîf Gunduz**
- 99 Çîrok û strana “Seydiko”yê, **Dildar Botî**
- 105 Dengbêjî û rista jina kurd di nava civaka kurd da, **Mustafa Borak**
- 115 Alastok û palastok, **Laleş Guler**

“Folklorî me” û “Kovara Folklorî Me”

Pêşîyên me gotîye, bihar bê gul nabe; “Folklorî me” bihara miletê me ye û “Kovara Folklorî Me” jî guleka vê biharê ye, bi qewilê kal û pîran, gulbihar e.

“Folklorî me” zevîyeka mişt kulîlk e, reng û reng e; “Kovara Folklorî Me” mîna zarokên ku di nava zevîyan da kulîlkan didin hev, berkevkar e.

“Folklorî me” kanî ye, kanîyeka bi kevirên şimşat lêkirî, hîmê wê zehf qewî ye û ava vê kanîyê ji deşt û newal û pal û mesîlan dinizile; ne kêma dibe ne jî dimiçiqe; “Kovara Folklorî Me” dixwaze vexwe dilopek avê ji vê kanîyê çimkî ew tî ye û ji tîbûnê jî sîtemkar e.

“Folklorî me” bastêq e, behîv e, benî ye; tûzik e, tolik e û kereng e li ser sifreyê, li benda xwarinê ye; “Kovara Folklorî Me” çil e û çilek e, xure û nefsek e, xwarinxurê xwarina hemû dem û wextan û li ber sifreya hazir, telepkar e.

“Folklorî me” stran e, govend e, geh heyran û lavij e geh dilok û mamik e; “Kovara Folklorî Me” çok vedaye li ber gotinbêj û dengbêj û destanbêjan, qeyd dike gotin, qise, peyv û şorê; guh dide malî, cîran û gundîyan mîna bûka ku nuh ketîye nava malê ye.

“Folklorî me” aş e û kes nemaye ku genimê xwe lê nehêraye û kes nîne ku nanê wî aşî nexwarîye; “Kovara Folklorî Me” ketîye pey civatên wî aş û wî zemanî û dixwaze fêr bibe ka jin û mîrên zemanê berê di sînga şerî da çawa dikirin fedakarî; rind û gozelên beg û mîr û êl û eşîran çawa dibûn sedema şerê xwarzê û xalan e.

“Folklorî me” şahî ye, dawet e û nasekine sê roj û sê şevan e, herweha şîn e, girîn e û qîrîn e; “Kovara Folklorî Me” çavnêrê dara zavayî ye û zarok e, li benda cerê bûkê yê tijî gûz û mewuj û şekir e; ne bes e, ew ji bo êş û kul û kederê, delal û hewarî ye.

“Folklorî me” ji me ra pişt û piştî ye; û “Kovara Folklorî Me” pişt daye piştî xwe û nîyet dike ku bigere tevî piştîyê li mal û zozan û gundan, cihê xwe çêbike li nava civatê û ew bibe malê giştî ye.





Rovî dîk kew û ordek

Renas Xendekî ▶

Gotox: Mela Cemîlê Sûsikî
Herêm: Dihê/Sêrt
Berhevkar: Rênas Xendekî
Dîroka Deşîfrekirinê:
09.10.2018

Ev helbest-fabl, ji hêla melayekî dihî ve hatîye berhevkerin û nivîsîn. Mela, piştî çîroka gelêrî berhev kirî, çîrok ji nuh ve wekî helbest nivîsîye. Lê hezar heyf û mixabin em navê vî melayî vêga nizanin. Ev helbest-fabl belav bûye li deverê û Mela Cemîlê Sûsikî ew qeyd kirîye. Bi vî awayî zargotin û cureyeka nûjen ya wêjeyê ketine nava hev; zargotin, bûye çavkanîya helbestê. Heta di vê helbest-fablê da çîroka gelêrî bêyî ku ji resenîya xwe dûr bikeve tenê wekî helbest hatîye sazkerin. Ji ber vê yekê min xwest ev helbest-fabl di vir da çap bibe, da ku xwînerên folklorê kurdî ji vê şêwazê haydar bibin. Yê ku helbest-fablê dibêje Mela Cemîlê Sûsikî ye, min jî ew ji bo we deşîfre kir.

Rovî (Hacî Muhemed), dîk (mela), kew (feqî), ordek jî (seyîd) e.



Rovîyek hebû pirtî
Pur⁽¹⁾ li gunda dipeltî

Şaşik dabû serê xwe
Tizbe girtin destê xwe

Got ez herim hecê
Bixwim mirîşka Xecê

Bikim hîle û fenda
Heta herime gunda

Rovî rabû bi rê ket
Du tiş cotî ber pê ket

Go ha gundekî ava
Serguhekî ji nava

Dît ku mirîşk diçêrê
Li ser sergo dinêrê

Rovî de hate ba wa
Silav kirye dîkê ha

Tizbîya dihejînê
Hêstira dirijînê

Go: “Birayê mela dîk
Mirin hate, va nêzîk

Şert ne ew e bang bidê
Rabe'm her mala Xudê.”

Dîk go: “Biraê rovî
Min jî wek te hec divî⁽²⁾”

Go zilamek lewend î
Gelek bi hîl û fend î

Gelek ditirsim ji te
Ewle nabim bextê te

Pur me dîne te'm xwarin⁽³⁾
Ji hingê ve em neyar in.”

Rovî go: “Ê bûrî⁽⁴⁾ çû
Xwe kar bike, were zû

Em ê bin biraê ebed
Navê'm, Hacî Muhemed

Sondê dixwim bi Yezdan
Ji wî re bûme poşman.”

Dîk rabû da pey rovî
Berê xwe dane zevî

Kewek wê dê dixwînê
Rovî çava dibînê

(1) Pur: Pir, zehf, gelek, zêde.

(2) Hec divî: Xwestina çûna tewafa Mekeyê, çûna hecê.

(3) Te'm xwarin: Te em xwarin.

(4) Bûrî: Borî, bihorî, derbas bû.



Kew go: “Rovîyê şaşik
Tu wî dijminik bêşik.”

Rovî rabû û girî
Tizbe hejand xwîn girî

Go: “Ez bûme gunehkar
Me tobe ye j’ fihlê par

Bi Qurana te xwendî
Ew hemî çûn, bûn rindî.”

Jev re⁽⁷⁾ gotin çend galgal
Kew jî rabû bû heval

Gihane ber ava çem
Nêrî ordekek li cem

Silam kirye ser wê jî
Rovî gote bêmejî

Go: “Bira tu seyîd î
Li va da çî t’kî bêxudî⁽⁸⁾”

Tu ziryeta resûl î
Hevqas tu bê usûl î

Rabe’m herin Medînê
Da tu cidê⁽⁹⁾ xwe bibînê

Hêvî bike’j Rebê wî
Xwe bavêj dergahê wî

Belkî em ‘efo bin tev
Da em herin ger û gev.⁽¹⁰⁾”

Rabû silav kir li ser
Tizbe hejandin li ber

Kew silama wî veda
Rabû hêdîka fir da

Rovî ba kir⁽⁵⁾: “Wa feqî
Çima tu dibî şeçî⁽⁶⁾?”

Ez im Hacî Muhemed
Ji bo min çêbûye derd

Ne ku vedî silavê
Rabe’m herin tewafê.”

(5) Bakirin: Bangkirin, gazîkirin,
denglêkirin.

(6) Şeçî: Keleş, mehkûm.

(7) Jev re: Ji hevdu ra.

(8) Bêxudî: Bêxwedî, bêxwedan.

(9) Cid: Mezin, kok, pêşî.

(10) Ger û gev: Binê tehtan,
cihê parastî ji sermayê.

Ordek jî pê re meşî
Rovî diçû dilxweşî

Li wan dibûye êvar
Dîtin qulek kûr û tar

Di qulê de dicivîn
Rabûn tev de dinivîn

Rovî go bûm gunehkar
Ez ê bibim nobedar

Rovî rabû nobed girt
Devê qulê li wan girt

Nîvê şêvê dibûrî
Dîk jî rabû digorî

Did a banga Xudayî
Rovî got: “Çi bela yî!

Bang ew e tu dî siharê
Tu vê şevê diqarê

Feqî bike şirî’et
Rastî bêje bê şibhet.”

Feqî rabû jê re got
Got û cergê xwe disot:

“Rastî ew e te gotî
Ne wekî melê gotî.”

Rovî serê dîk jê kir
Di paşîya qulê kir

Kete serê siharê
Kew jî rabû diqarê

Şî⁽¹¹⁾ xwe re hinkî dixwînê
Ji Quran û Yasînê

Rovî got: “Ev çî edet
Quranê dixwînê xelet

Seyîd bêje bi rastî
Bê hîle û bê qestî.”

Seyîd rabû jê re got
Got û cergê xwe disot

Serê feqî jî firand
Paşîya qulê hiland

Ma seyîd û ma rovî
Seyîd j’ tirs a nanivî

Rovî ba kir: “Wa seyîd!
Va nêzik bû li me ‘îd

Kitêbê deyne ber xwe
Ji mi re bêje ‘eslê xwe.”

Seyîd go: “Rovîyê şaş î
Tu ewqa devbelaş î

Me heye biraek piçûktir
‘Eslê min wî xwe re bir

Belê ya hacîyê delal
Ez ê rabim herim mal

Ez ê bînim biraê xwe
Bi şahid û ‘eslê xwe.”

Rovî go, “Here bîne
Lê belê pur nemîne.”

Seyîd gotî, “ser çava
Hacî mala te ava.”

Ordek rabû bi rê ket
Bi fir dabû ba’l ber pê ket

Giha yekî nêçîrvan
Pê re hene pehewan

Du tajîyê pur sivik

Seyîd rabû çûbû nik

Tajîya lê har dabû
Seyîd rabû fir dabû

Hêdî hêdî dimilmilê
Heta hate vê qulê

Ba kir: “Ey hacîyê min
Va ‘esl û şahidê min.”

Rovî rabû bê mefer
Ji qulê ew hate der

Tajî rabûn çûn rovî
Heta’j rovî hat revî

Go: “Seyîd ne hewce ye
‘Eslê te pur taze ye

Sondê dixwim bi Yezdan
Wek te nîne ‘eslê van.”

Rovî kete nav devî
Tajî hat û lê civî

Tajîya rovî girt û xwar
Seyîd xilas bû’j neyar

Seyîd çî kir sîyaset
Heta’j lepê wî derket

Lazim e ji bo me kurdan
Du şahidê pehewan

Wis an bikin sîyaset
Heta ku bibne dewlet

Da dijmina bikujin
Xwîna wan jî birêjin

Li ser wilat bigirîn
Bidin dilxan û hezîn ●



Şîn û rîtuêlên şînê li Tizyana Mêrdînê

Mem Mukrîyanî

folklorame

Tenê tişteke digihîje keçan, ew jî şar e. Heke zarokên wê navê wê hîlanîbin, “şar, şirik û xazî”yên wê didin wê keça ku navê wê lê hatîye kirin. Ku ew keç bi zarokên apê xwe ra bizewice ew şar, şirik û xazî pê ra dimînin. Lê ku bi xerîban ra bizewice, ew bi xwe dihere wan bi destê xwe dide metika xwe ya mezin.

